

Saziya fêrkirin û parastina Zimanê kurdî li Sûriyê

Zimanê Kurdî li rojhilata navîn , yek ji zimanên kevnar e . Ji hezar salan ve , bawerî , raman,adet,folklor û hebûna gelê Kurd parastiye . Bi sedan dîroknivîs , helbestvan û nivîskarên , ew bi kar anîne . Lê mixabîn , ji destpêka sedsala bîstan ve , gava nijadperestan xwestin miletê Kurd tune bikin; Berî giştî dest avêtin zimên û karanîna wê qedexe kirin .

Li Sûriyê jî , helwesta rijîmê di tenga zimanê me re, qedexe û tunekirin e . Ji ber wê jî , ji her kurdekî tê xwastin li hember wan pîlanan raweste û pûç bike .

Avakirina Saziya me , ji bo em kanibin di warê fêrkirin û parastina zimanê dê de , bi rêk û pêk bixebitin .

1.Armançên Saziyê :

a. Piştgiriya axaftin û peyvandina bi zimanê dê :

Di vî warî de , têvedana gelê me yê Kurd berve bikaranîna zimanê zikmakî bi hev re , li şûna zimanên dî (di riya çalakiyan re) .

b. Fêrkirina xwendin û nivîsandina bi kurdî :

Ev jî wê bi hemî şeweyên gengaz bê xebitandin { kors , CD }

2.Avakirina Saziyê :

a.Komîteyên mamosteyan:

Ew ji mamostên alfabê û rêzîmên pêktên , û stubariya wan fêrkirina zimanê dê ye (alfabê , rêzîman , xwendin , nivîsandinû H. W. D).

b. Komîteyên herêman :

Li her herêmekê komîtak, ji nav mamosteyên zimanê kurdî, yên wê herêmê were hîlbijartin . Bi şeweyekî rêkûpêk bicive û salê carekê komcivînekê ji mamosteyan re li dar bixe , tede kar û bar werin nirxandin , pîlanên nû werin danîn û komîteyêke nû were hîlbijartin .

c. Komîteya rêvebir ya giştî :

Divê komîta rêvebir ya giştî, ji pênc kesên hîlbijartî avabibe , dudu ji parêzgeha Hesekê , dudu ji Helebê û yê pêncan ji Şam . ew ji nav komîteyên herêman yên her parêzgehekê tê hîlbijartin . Komît bi awakî demkî dicive û rêvebirîya karê saziyê li dirêjîya salekê dike .

3.Stubariyên komîteyên herêman :

-Bicîhkirina pêdiviyên fêrkirinê , mîna : Mamoste , pirtûk , pere

-Birêkûpêkirina fêrkirin û parastina zimên .

-Bicîhanîna biryarên saziyê .

-Her komîtek kane li gor rewşa xwe bixebite .

-Li gor armanca saziyê, têkelî û pêwendî bi zimanhez û fêrkarên zimên, yên derveyî saziyê, di herêma xwe de .

- Têkildarî bi komîteyên mamostan re .

4.Stubariyên komîta rêvebir ya giştî :

-Têkeliyên ji bo zimên bi derve û hundir welêt re .

-Hevgirêdana komîteyên herêman bi hev re .

-Girêdana konfiransên giştî, ji bo zimên ,bi alîkariya komîteyên herêman, li gorî hewcedariyê.

- Xwedîderketin li girtiyên zimanê kurdî .

5.Diraviya saziyê :

Her komîtek herêmî, di diraviya xwe de serbixwe ye . Lê xerciya komîta rêvebir, ji diraviya komîteyên herêman e.

Çavkaniyên diraviyê :

-Alîkariya hemî dostên Kurdan .

-Camêrî û alîkariya welatîyên Kurd.

-Alîkariya partiyên Kurd .

-Alîkariya saziyên zimên li welêt û derve .

-Firotna pirtûkan .

29/11/2006